

Kurtiya Rapora Çapemeniyê ya bînpêkirinên mafan a Platforma Jinên Rojnameger a Mezopotamyayê ya 2018'an

Me wekî Platforma Jinên Rojnameger a Mezopotamyayê Rapora sala 2018'an a Bînpêkirinên Mafan a li Hemberî Jinên Rojnameger weşand.

Li Tirkiyeya ku di qada çapemeniyê de her ku diçe paş ve diçe di 2018'an de jî tablo neguhert. Bi derxistina zagonên RTUK'ê gelek weşan hatin betalkirin, ceza hatin birîn, çêkerên bernameyan û rojnameger hatin tehdîdkirin û hedef hatin nîşandan. Kesên ku ji vê helwesta îktidarê hêz girtin hembêşeyên me ji ser medyaya civakî û bi telefonê tehdîd kirin. Ev bêhurmetiya ku li dijî rojnamegeran tê kirin nayê qebûl kirin. Sîxurtî li ser rojnamegeran ferz dîkin. Rojnamegerên ku peywira wan derxistina rastiyê ye bi ferzkirina sîxurtiyê rû bi rû dimînin. Ev şermek mirovahiyê ye. Xebatkarên çapemeniyê yên ku bejna xwe natewînin bi girtin, binçavkirin, çewisandin û gefxwarinê rû bi rû dimînin. Ev pêkanîna û polîtîkayên tirsê dê gavê bi rojnamegeran paş de nede avêtin. Li dijî polîtîkayên çewisandinê baweriya rojnamegeran bêtir zêde dibin û têkoşîna xwe didomînin. Li Tirkiyeya ku ewlehiya rojnamegeran tune ye, cinayeta Rojnamegerê Suudî Cemal Kaşıkçı tesaduf e gelo? Yan tercîhek bi zaneyî ye?

Piştî OHAL'ê binçavkirina rojnamegeran zêde bû. Di sala 2018'an de jî rojnameger li koridorên edliyyê bûn. Derbarê wan de gelek doz hatin vekirin. Rojnameger mecbûr man ku li dijî dadger pişeya xwe biparêzin. Jinên rojnameger ku di bin çavan de lêgerîna tazî li wan hatin ferzkirin û bi pêkanînan ne baş rû bi rû hatin hiştin, rêya têkoşîna hilbijartin. Bûyera ku di sala 2018'an de jê herî zêde deng da jî tayinkirina qeyyuman a li ser Çapxaneyê Gunê û Rojnameya Ozgurlukçu Demokrasiyê bû. Xebatkarên çapxaneyê û rojnameyê hatin girtin. Ji bo çavkirina Rojnameya Welat a bi Kurdî, çapxane nehat dîtin. Li rejîmê ku bi zextan bi rê ve dibin ev pêkanîna tehdîdkirina çapxaneyan tê dîtin. Tirkiye wergeriyaye welatê qedexeyan. Nehiştin rojnameger beşdarî dozên, kesên ku bi îradeya gel hatine hilbijartin, bibin.

Divê em wekî medya û xebatkarên çapemeniyê zimanê zayendperest, zimanê ku tundiyê rewa dike û jinê tune dihesibîne bibînin. Em wekî jinên rojnameger dîsa dibêjin ku em cîhana çapemeniya ku li ser derewan ava bûye qebûl nakin û em ê li her derê têkoşîna xwe bidomînin. Mînaka herî baş jê yek televizyona jinê Jin Tv ye. Bi Jin Tv'yê reng û dengê jinê derdikeve pêş. Dê sala 2019'an ji bo çapemeniyê bibe sala serhildana bê dem. Em wekî Platforma Rojnamegerên Jin a Mezopotamyayê kelecana parçeyek ji vê serhildanê ne û bi sekna xwe ya bi biryar em ê di 2019'an de jî li gel jinan cihê xwe bigirin û em ê biqêrin bibêjin 'Rojnamegerî ne sûc e'."

Jinên Rojnameger ên ku di sala 2018'an de hatin girtin

*Seda Taşkin

*Ozlem Seyhan

*Kibriye Evren

*Reyhan Hacıoglu

*Hicran Urun

*Pinar Tarlak

*Ece Sevim Ozturk

*Pinar Gayip

*Semiha Şahin

*Tuba Bulut

*Reyhan Çapan

*Serpil Unal

*Songul Yucel

Rojnamegerên jin ên ku hatin tehliyekirin

*Şerife Oruç

*Pinar Tarlak

*Ece Sevim Ozturk

*Serpil Unal

*Songul Yucel

*Havva Cuştan

Jinên Rojnameger ên ku li Tirkiyeyê girtî ne

1. Leyla Yıldız, Xebatkara Ozgurlukçu Demokrasiyê

2. Asli Ceren Aslan, Mudura Karê Nivîsê ya Ozgur Gelecekê

3. Ayşe Nazlı İlicak, Nivîskara Rojnameya Yarına Bakış

4. Burçin Dokgoz, Nûçegîhana Zaman û Cihanê ya Çorumê ya berê

5. Ceren Taşkın, Xebatkara Dengê Hatayê

6. Gurbet Çakar, Xebatkara Kovara bi navê Hêvî ya Jinê

7.Hanım Būşra Erdal, Nūçegîhan û nivîskara kuncikê ya Zamanê ya berê

8.Hatice Duman, Mudura Karê Nivîsê û xwediye Rojnameya

9.Hicran Urun, Editora Ozgurlukçu Demokrasi

10.Isminaz Temel, Editora ETHA'yê

11.Meltem Oktay, Xebatkara DÎHA'yê

12.Mizgin Çay, Radyoya Karacadagê

13.Pinar Gayip, Nūçegîhana ETHA'yê

14.Reyhan Çapan, Mudura Karê N...